



## Australian Government

### Department of Health

#### Xeta Alîkariya Temenmizinan (ixtiyaran) bo COVID-19

Alîkariya bi temenmizinan re di dema vîrosa korona de grîng e. Xeta Alîkariya Temenmizinan bo COVID-19 jibo domandina peywendiyên di navbera ixtiyaran, hezkiriyên wan û miqayitkarên wan de grîng e û bo domandina wergirtina xizmetên hewcedariya wan di dema COVID19 de pê heye alîgir e. Xeta alîkariyê piştgiyaya sûdmend û şîretan pêşkêş dike.

Dikarî xwe derheqê sînorkirinên bi vîrosa korona ve eleqedar de agahdar bikî, agahiyên derbarê xizmetên miqayitiya li ixtiyaran de bi dest xî, yan bi kesekî re li ser tenduristiya derûnî bi axafî. Kesên derheqê xwe de, yan hevalemkî/hevalemkê de, yan endamekî malbatê de ji ber rewşa nexweşiya jibîrçûnê (*ementia*) xemxwar in, dikarin bi rêya xeta alîkariyê bi şîretvanekî perwerdekirî yê *Dementia Australia* re bi axafin.

Xeta Alîkariyê bo alîkirina temenmezinan, xizmên (meriyên) wan, miqayitkarên wan, dost û piştgirên wan li vir e. Xizmeta telefonî ya belaş duşemê ta îniyê vekirî ye, rojên tatîlan ne tê de, ji demjimêr 8:30ê sibehê ta 6ê êvarê. Dikarî li ser vê jimarê telefone xeta alîkariyê bikî: **1800 171 866**.

Ger baştir dibînî li şûna Înglîzî bi zimanekî din bi axafî, wergêrek dikare alîgir be. Li ser jimara **131 450** telefone xizmeta wergera nivîskî û devokî, *Translating and Interpreting Service*, bike û li zimanê xwe bipirse. Dikarî bi zimanê xwe girêdana bi Xeta Alîkariya Temenmizinan bo COVID-19 re bixwazî.

#### Xizmeta Serîlêdanên ji Civatê

Xizmeta Serîlêdanên ji Civatê (*Community Visitors Scheme*) hevalbendiyê û peywendîgirêdana civatî bi temenmezinan australî re pêşkêş dike. Ixtiyaran bi kesên xwe bi xwe vî karî dibijêrin re (*volunteers*) eleqedar dike da ku car-caran demê bi hev re derbas bikin. Di dema vîrosa korona de ev dikare bi telefonê yan bi rêya vîdyo be, çimkî hevdiîtina rû bi rû ji ber pêdiviya jihevduriyê ne mumkin e.

Peywendîgirêdana car-carî ya berdewam bi yê xwe bi xwe vî karî dibijêrin re hestê guhlêdanê li nik kesan bi rê dixê û alîkariya kesên xwe îzolekirî û bi tenê hestê dikin dike. Xizmeta Serîlêdana ji Civatê xizmeteke belaş e bo kesên temenmezinan yê nuha miqayitiya bi alîkariya diravî (aborî) ji dewletê bi dest dixê yan di xaniyên dewletê de ne, her weha bo kesên daxwaza wan dikine.

Kesên temenmezinan dikarin xwe bi xwe hewaleye Xizmeta Serîlêdana ji Civatê bikin. Hewalekirin dikare herweha ji yê miqayitiya li ixtiyaran dikin be, ji endamên malbatê be,

yan ji dostan. Bo bêtir agahdarî vê malperê veke: [www.health.gov.au/community-visitors-scheme](http://www.health.gov.au/community-visitors-scheme)

### **Grîngiya tenduristiya derûnî (*Mental wellbeing*)**

Vîrosa korona weha kiriye ku gellek guhertin têkevin şêweya jiyana me. Ger xwe xemxwar, bi tenê, li-hev-şaşbûyî, yan bi tirs hest bikî axaftina bi endamên malbatê û dostan re, yan bi pijîşkê xwe re (doktor) dikare alîgir be. Bo bidestxistina agahiyan, şîretan, û jimareke ji xizmetên din, vê malperê vek: [www.headtohealth.gov.au](http://www.headtohealth.gov.au)

### **Bêtir agahdarî**

Grîng e mirov agahiyan ji şûnên fermî bi dest xe. Vê malperê veke: [www.health.gov.au/resources/translated](http://www.health.gov.au/resources/translated) yan telefone xeta al]kariya bo vîrosa korona bike: **1800 020 080**.

*COVIDSafe app* daxe mobîlfona xwe bo alîkirina ewlehîhîştina malbata xwe, dostên xwe û civata xwe. Ji bilî Înglîzî *COVIDSafe app* nuha bi van zimanan jî heye: Erebi, çînî ya hêsankirî û kevneşopî, Vîyetnamî, Koryayî, Îtalî, Yewnanî, Puncabî û Tirkî. Ev *App* dikare ji malperên *Apple App store* û *Google Play store* were bidestxistin. Dikarî ji endamên malbatê, dostan, yan karmendekî miqayitiya li ixtiyaran bixwazî bila bo bidestxistina vê *appê* bi te re alîgir bin.